



Die Beauftragte der Bundesregierung
für Migration, Flüchtlinge und
Integration

TIŞTÊ KU PÊWÎST E DERBARÊ KORONAYÊ BIZANÎ

Xalên têkildarî reftar, qanûna kar
û rêzikên gerrê bi awirekê

Li vir tu dikarî hin lêzanînan
derbarê App'a hişyariya
Koronayê ya dewleta federal bi
zimanê xwe yê zikmakî bibînî.



[www.integrationsbeauftragte.de/
corona-warn-app](http://www.integrationsbeauftragte.de/corona-warn-app)

Girîng:
Bi vaksînekirina Koronayê,
xwe û kesên din biparêze!



[www.integrationsbeauftragte.de/
corona-virus](http://www.integrationsbeauftragte.de/corona-virus)

Tendurustî

EZ ÇAWA DIKARIM XWE Û KESÊN DIN BIPARÊZIM

Gişt dikarin di warê têkoşîan dijî Koronayê da alîkariyê bikin. Têkiliya digel kesên din heta radeya pêkan kêm bike û têkiliya xwe bo komeke kesên neguhêr sînordar bike. Tenê bi vê riyê dikarî rê li ber tûşbûnê bigirî. Hertim girîng e:



Şûştina destan
(herîkê
20 çirkeyan)



Navbira te digel
kesên din herîkê
1.5 metro be.



Maskeyê daye.



Di nava enîşk an
destmaleke kaxezî da
bikuxe an bipişke.



Hewayê atmosferên
girtî bi qasî pêwîst
biguherîne.



ÇIMA DIVÊ EZ LI DIJÎ VÎRÛSA
KORONAYÊ BÊM VAKSÎNEKRIIN?

- Tu xwe, xizm û kes û hemî kesên di têkiliya bi xwe ra diparêzî.
- Vaksînekirin dilxwazî û bêpere ye. Derbarê dema vaksînekirinê tu dikarî bi riya hejmara 116 117 agahiyên bi dest bixî.
- Vaksîn bi diqet ji hêla tehemil, ewlehî û bandorkirinê va hatine ceribandin.



HEKE EZ WIHA GUMAN BIKIM KU TÛŞ
BÛME, DIVÊ ÇI KAREKÎ BIKIM?

Gelo têkiliya te bi kesekî ra hebûye ku ew tûşî vîrûsa Koronayê bûye? Derdem bi riya telefonê digel rêveberiya tendurustiya xwe bikeve têkiliyê! Heta heke tu nîşaneyeka nexweşiyê tunebe. Bi riya hejmara telefona 116 117 tu dikarî mekanê ku dikarî li wir test bidî, bizanî. Heta dema ku encama testê were ragihandin, li malê bimîne!

JİYANA GELEMPERÎ



BABETËN JÊRÊ DI ATMOSFERA GELEMPERÎ DA TÊN SEPANDIN:

Navbira herîkêm a 1.5 metroyî biparêze. Tu divê li mekanên jêrê maskeya bijîşkîyê daynî: Li wesayîten veguhestina gelemperî, dema kîrînê, li mekanên bi hatûçûna gel û li mekanên vekirî ku gelek kes li wan deran hene. Heke nekarî navbira ewleh a 1.5 metroyî biparêzî, di cihê karkirinê da jî danîna maskeyê pêwîst e.

Kesên ku bi tamî hatine vaksînekirin an ji nexweşîya KOVÎDê rizgar û baş bûne, dikarin bi her hejmareke kes an hevdîtîna digel kesên ku nehatine vaksînekirin, nayên hesab. Wan tu sînardariyek jibo derketinê tunene û wek wan kesên tîne hesab ku testa wan nerênî derketiye. Testeka ceribîngehê (PCR, PoC-PCR) ku herîkêm 28 roj an herîpirr 6 mehan beriya niha pêk hatibe, wek sselimandina başbûnê pêbawer e.

Vaksînekirina tam divê herîkêm 14 rojan beriya niha pêk hatibe.

HEKE ZÊDETIR JI 100 BABETËN TÛŞBÛNÊ BIQEWIMIN, DÊ ÇI QANÛN BÊN SEPANDIN?

Frena awarte ya federal ku dewleta federal û parêzgehan derbarê wê li hev kirine – û renge di roja 30ê Hezîrana 2021ê dema wê derbas bibe – heke hejmara babetên nû yê tûşbûnê zêdetir ji 100î be, kiryarine cûrbicûr pêşniyar dike. Xwaringeh û kafe dê girêdayî bimîn (seredan jibo wergirtin û birina derve pêkan e). Ev babet derbarê Bar, klûb, Şanoxane, salûnên Konserê, Sînema, parkên seyranê, klûbên werzişî, hewzên avê, salûnên çaksaziya leşî û xemlîngehan tîne sepandin. Pîrraniya firoşgehan heta asta qewimîna 150 babetan vekirî dimînin. Mişteriyên hewcetî bi diyarkirina dema seredana ji berê va û encama nerênî ya testê hene.

Derketina ji malê ji aet 22 heta 5ê berbangê tenê ji ber hegera bawerpêkirî pêkan e: Wek mînak çûyîna bo kar, babetên awarte yê bijîşkî an lêmiqatebûna ji ajelan. Heta saet 24 dikarî bi tenê bimeşî an werziş bikî.

Hevdîtînen xusûsî: Endamên malbatekê tenê destûra xwe hene ku bi kesekî din ra hevdîtîna bikin (zarokên heta temenê 14 salî nayên hesab).

Ji asta qewimîna 165 babetên tûşbûnê û pê da, dibistan û baxçeyên zarokan (lêmiqatebûna berdewam) tîne betalkirin. Istîsna derbarê polên dawiyê û dibistanên taybet pêkan e.

Li parêzgehên federal qanûnên diwartir jî pêkan e. Heke hejmara babetên nû yê tûşbûnê di bin 100î da be, rêzikên parêzgehan tîne sepandin. Lêzanînen di vî warî da li malperên parêzgehên federal hene.

Karkirin û Pere



HEKE XWEDIYÊ KARÊ MIN JI BER KORONAYÊ CARÊ XEBATÊ BIDE RAWESTANDIN, DÊ ÇI BIQEWIME?

Tu yê hema wisa heta heke nexebitî, mafê wergirtina meaşê hebe.

HEKE EZ BÊKAR BÛM, DIVÊ ÇI KAREKÎ BIKIM?

Tu divê vê yekê ji navenda kar an Ajansa kar ra bibêjî. Ew her du tenê di babetên lezgîn û bi biryara hevdîtîna ji berê va seredaneran qebûl dikin. Tu dikarî bi rîya telefonê an jî bi awayê online bêkarbûna xwe ragihînî. Her wiha tu dikarî daxwazan bi awayê online raber bikî. Girîng: Qanûnên Parastina li hemberî dersînorkirinê hema wisa bawerpêkirî ne. Ji bilî vêya, bidestxistina ewlehiya bîngeh jibo kesên li dû kar digerin, hatiye hêsankirin.



HEKE XWEDÎKARÊ MIN DESTÛRA XEBATA DEMKURT BIDE, DÊ ÇI BIQEWIME?

Tu dikarî destmizda karê demkurt heta 24 mehan werbigirî. Ev dikare heta sedî 87 ji meşa te ya jidestçûyî

bigire ber xwe. Ajansa Kar a berpirs bi awayê babetî dê vekolîne ku gelo hemî şert û merc hene an na.



EZ DIKARIM ÇI ALÛKARIYÊKÊ JIBO KOMPANIYA XWE WERBIGIRIM?

Enistîtûya Kîredîta Nûavakirinê (KfW) deynên şirketî yê cûrbecûr bi bihayê guncan raber dike. Ji kerema xwe seredana banka kompaniya xwe an her wiha şirketê xwe yê aborî jibo wergirtina deynên KfW bike. Kompanyên biçûk û navgîn ku pêşniyara fêrbûna xwe ya kar bi fêrbûna kar a nû dabîn dikin an berfireh dikin, piştgiriya aborî werdigirin.

KESÊN KU TENÊ BI XWE DIXEBITIN Û KARÊN BIÇÛK ÇI CÛRE PIŞTGIRIYÊKÊ WERDIGIRIN?

Bernamneyeka taybet a KfW bi şertên deynê yê funcan, alûkariya xerc û mesrefê jibo mesrefên operasyonî, misogerkirina bi beûşdariya dewleta Federal, kiryarên alûkariya sermalê û pakêteka piştgiriya jibo kompanyên nûdamezirandî (Start-up) li ber dest e.



ÇI PIŞTIRIEK JIBO XWENDEKARAN HEYE?

Xwendekarên ku hewcetiya wan a zêde ya aborî heye, jibo wergirtina alîkariya mesrefê ji Yekîtiya Xwendekarên bila daxwazê bidin. Ev alîkariya mesrefa mehan herîpirr 500 Euro ye. Ji bilî vê yekê, kiredîta xwendekarên a KFW jibo xwendekarên derveyî heye.



GELO EZ DIKARIM JIBO ALÏKARIYA XERCÛ MESREFA ZAROK DAXWAZ BIDIM?

Heke derhata te jibo tevahiya malbata te têrê neke, alîkariya mesrefa zarok pêkan e. Di sala 2021ê da tu dikarî 30 rojan alîkariya mesrefa nexweşîya zarok pêka her yek dayîk û bavan (60 rojan di rewşa ku tenê yek ji dêbavan hebe) werbigirî. Ev babet her wiha di rewşa ku ji ber Pandemiyê, dibistan an zarokxane girêdayî bin û neçar bî ku zarokên xwe li malê xwedî bikî, rast e.



DERBARÊ GERR Û SEFERÊ ÇI QANÛN HENE?

Divê dev ji gerrên xusûsî û geşt û gerra li nav û derveyî welêt li pêwîst nîne, were berdan. Beriya çûyîna bo derveyî welêt, ji kerema xwe digel Wezareta karên derve ya Federal û Wezareta karên hundir a federal ra bikeve têkiliyê da ku haya te ji sîndaryên niha yên hatinê û kontrolkirina sînoran hebe.

DEMA VEGIRIYANÊ DIVÊ HAYA MIN LI SER ÇI BABETAN HEBE?

Kesê ku ji navçeyeka pirxeter bi hejmara zêde ya babetên nû yên tûşbûnê an navçeyeka belavbûna cûreyên vîrûsê derbasî Almaniyê dibe, divê beriya hatinê forma tomarkirina hatinê ya dijîtal tijî bike. Di hemî gerrênasimanî û di her cara hatina ji navçeyeka bi hejmara zêde ya babetên nû yên tûşbûnê an navçeyeka belavbûna cûreyên vîrûsê, encama testa nerênî pêwîst e. Di babetên din ên hatina bo Almaniyê ji navçeyeka pirxeter da, tu dikarî belgeya encama testê herîpirr heta 48 saetan piştî hatinê raber bikî.

Piştî hatinê divê hemî kes bi giştî bi qasî 10 rojan an heke hatin ji navçeyeka belavbûnan cûreyên vîrûsê pêk were, bi qasî 14 rojan biçin qerentîneya navmalî.

Heke encama testa Vîrûsa Koronayê ya te nerênî bûye, bi tamî li dijî wê hatiyê vaksînekirin an pêştir nexweşîya Koronaya te baştir bûye, pêwîst nake ku piştî hatina ji navçeyeka pirxeter biçî qerentîneyê. Heke hatin ji navçeyeka bi hejmara zêde ya babetên nû yên tûşbûnê be, tenê kesên testkirî divê bi qasî 10 rojan biçin qerentîneyê, ji roja pêncem a piştî hatinê, bidawîanîna vê qerentîneyê bi pêkanîna testeke din pêkan e. Kesê ku bi tamî hatiyê vaksînekirin an baş bûye, tenê di rewşa hatina ji navçeyeka belavbûna cûreyên vîrûsê divê beriya têketinê testê pêk bîne û piştî hatinê biçe qerentîneyê.

Tu dikarî bi riya hejmara telefona 116 117 agahiyan bi dest bixî ku li ku dikarî testê bidî.

Dikkat: Baldarî: Binpêkirina soza qerentîneyê renga bibe sebaba sepandina cezaya pere.

Jibo bidestxistina agahiyan ji vê yekê ku kîjan welat di lîsta xeterê, asta zêde ya tûşbûyîyan an cûreyên vîrûsê ye, dikarî seredana malpera jêrê bikî: https://www.rki.de/DE/Content/InfAZ/N/Neuartiges_Coronavirus/Risikogebiete_neu.html



EZ JI KU DIKARIM AGAHİYÊN PÊBAWER DERBARÊ VAN MIJARAN BI ZIMANÊN CÛRBEÇÛR BIBÎNIM?

Înternet tijî gotegot û nûçeyên sexte ye ku bilez bi riya komên Çetê (Chatgrup) tên weşandin.

Weşan:
Nûnera dewleta federal di warê Koçberî,
Penaber û Entegrasyonê da

Roj:
01.06.2021

Agahiyên birojkirî bi zimanên cûrbecûr ku dikarî baweriya xwe bi wan bînî, li vir bibîne:
www.integrationsbeauftragte.de/corona-virus û
www.eu-gleichbehandlungsstelle.de/corona-virus.

